

Çima alfebe û ne abe ?

Memê Alan

Her miletêkî ji tîpên zimanê xwe re navlêkirinek dît û lêkir . Wek nimûne gelê Erebi , ebcediyê "**Elêfba**" bi karanî , û gelên Latînî jî Alfebetîkal , Alfebêt , alfevêt ... bi kar anîn . Herweha wexta C.B tîpên Kurdî yên Latînî afrandine , navê alfebe lêkir .

Di dûre hinan alfabe , hinan jî alfebe , û hinên dî jî elfabe ... H.W.D bi kar anîn .

Dema mirov di hemî durvên jorîn temaş bike , wê têbighê ku binesaziya hemiyar yek e , û hemî jî vedigerin binesaziya navlêkirina Yûnaniyan .

Lê , her miletêkî guherînek biçûk kiriye ya resen , û cilekî nû lêkiriye , ta ku li bejna zimanê wî were . Herweha nemirê me C.B di navlêkirina xwe de wê şopa ajotî .

Lê piştî danûstandinek mezin di saziya fêrkirin û parastina zimanê Kurdî li Sûriyê de , û şirovekirina vê navlêkirina C.B , me dît ev navlêkirina ne li gor form û bejna zimanê me ye .

Weke me li jor diyar kirî cudatî di lêvkirina wê de çêdibe , û herweha lêvkirina wê jî giran e .

Wêlomê jî , li ber ronîya pêşinyaza endamêkî saziyê , ku navlêkirina (Abe) şûna (Alfabe) yê bigre , me biryara wê navlêkirinê ji ber van sedemên jêrîn da :

- 1- Bilêvkirina wê ji ya berê hêsantir e , û bêtir li bejna zimanê me tê .
- 2- Berê zimanên jîndar berve hêsankirin û lezkirinê ye .
- 3- Binesaziya wê ji ya resen ne cude ye , tenê hin tîp hatine kurtkirin . Yanê avêtina hin tîpan ji ya berê ye .

4- Sûdegirtina ji aliyê dem û aborî ve ji ber ku kurtkirina hin tîpan , yanê kurtkirina dema bikaranîna wê ji aliyê bilêvkirin û nivîsandinê ve , û herweha sûdegirtinek aborî jî tê de heye .

Bi taybetî jî eger mirov serjimarekê , li dirêjiya dîrokek hinekî dirêj di pirtûkxana Kurdî de çêbike .

Li dawiyê û ji vir û wê ve , emê (abe) li şûna Alfebe di çarçewa saziya xwe de bikarwînin . Lê nayê wê wateyê ku sînga me ji hemî nêrîn û rexnên werin re ne vekiriye .

Herweha gengaz heye ku em ji biryarên xwe jî vegehin ger hin nêrînine dî berbiçavê me bikin , û bawriya me biguhêrin .

Rojnemevanê Kurd Faroq Hecî Mistafa hate girtin

Faroq ji gundê Zerka- herêma Kobaniyê , Xewndekarê zanîngeha

Lubnanê, beşê

siyasî ye.

Di 05- 04- 2009 an de,

rojnemevanê Kurd

Faroq Hecî tê binçavkirin

û ta nuha jî hîn rewşa wî

ne xuya ye. Wî di pir Rojnemeyên Erebi de nivîsarên xwe weşandine "el-sefir, el-kîfah-al-erebi , el-heyat, el-lundiniyê , elweten elsûriyê" û H.W.D. Lewre jî di nav refên nivîskar, rewşenbîr û siyasetvanan de xwedî rêz û hurmet e.

Hêjayî gotinê ye ku, mamoste Faroq ji derketina derveyî welêt qedexe ye.

